

GIRINGIYA R O J Ï G I R T I N Ê Û HINEK CEJNÊN ME ÊZDIYAN

Li gorî ku di qewl û duhayêن me Îzdiyan de xwanê dibe, Milyaketan di roja şemiyê de dest bi afirandina dinya yê kirine û di roja dûşemê de jî qedandine. Lewma ye ku Îzdî di roja sêşemê de dest bi girtina rojiyên ji bona Milyeket û Qelenderan dikan.

Wekî dinê em Îzdî vêga hêjî dibêjin, ji bo roj ji tengasî û tariyên zivistanê zu derkeve û dinya ji me hemû ruhilberan re xweş bive, em bangî hemû Xwedanêن (Tawisî-Melek, Şêx Adî, Şêşims, Îzî û whd.) xwe dikan û ji destpêka meha kanûnê şûnde de gelek rojiyan ji bona wan digrin û cejnêن wan pîroz dikan. Her wusa, gava roj ji tengasî û tariyan xelas dibe jî, em dîsa gelek rojiyan ji bo Xwedanêن xwe digrin û cejnêن(weke îda: bilindê, batizimî, cilê zivistanê, Xidiryas, Xidirnebî, Newrozê, Çarşema sor û whd.) wan pîroz dikan.

Ferzên rojî girtinê, divê her evdê Îzdî ku fahm dike, temen mezin û saxiya wî li cîh be rojî bigre. Îzdî di berbanga sibê hêja stêrka sibê neavîtî de, radibin **paşîvê** dixwin û jê pêde jî, heta roj biçe ava qet tû tiştekî ne dixwin û ne jî vedixwin.

Li ba me Îzdiyan mahna rojî yê ne ku meriv hima xwe tenê birçî bike. Dema evdêن Îzdî bi rojî bin, divê ew di wî wextê de ruhêن xwe paqîj bikin; yanî xizmetê ji hevûdinê re bikin, haj ji axaftina xwe hebin, dema yek xeberên nebaş û çiran bi meriv bike, meriv jî çêr û xebrêن wî lê venegerîne(bersiva baş ewe hingê meriv bêje ez bi rojî me), xwe ji têkiliyên cinsî û tiştên xirab dûrbikin, xêr û xérata bidin.

Kesên temenê wan piçûk anjî gelekî mezine, nexweş, bidûhalî(bihemle), bêmecal û whd.in ne mecbûren rojiyan bigrin.

Dema yek bi hemda xwe tiştên ku rojî yê dişkênin-xera dikan(tiştekî bixo, vexo, vereşandina xwe bîne, bikeve têkiliyên cinsî û whd) bike, hingê rojiya meriv dişkê û ew rojî qebul nabe.

Gava roj diçe ava, Îzdî gazî Xwedanê ku jê re rojî girtine dikan û **fitara** xwe bi gezek nan(qutê îmanê ye) yanîj bi paçûkirina beratekê(axa nav mala Şêx Adî ye) vedikin û dûre dibêjin:“ Ya , min ji te re ev rojî girt, tû vê rojiya min ji xwe re qebul bikî.....“.

ROJÎ Û İD-CEJNÊN ÎZDIYAN

Rojiyên ku em Îzdî hêjî ji bo Xwedê, pîroziya Milyaket, Xas, Qelander û hemû kevneşopên dînê xwe digrin evin:



1. *İd û rojiyên Şêşims*

Îzdiyên ku Xwedanê wan Şêşims be, ew tenê (li herêmên Xaltiyan hemû Îzdiyan) van sê rojiyan digrin. Pêwîste meriv van her sê rojiyan dû heste berî roja ïna ku yekemîn dikeve meha kanûn(bi hesabê kurmancî meha 12 ye)ê, di roja sêşem, çarşem û pêncşemê de bigre û di roja ïnê de jî id(cejin)a Şêşims çêbike.

Wekî dinê, di nav zargotina Îzîdiya de navekî rojê jê Şêşims e û tê gotin ku ev rojî ji bo pîroziya rojê jî tê ne girtin.

2. *Îd û rojiyên Xwedan*

Li gorî kevneşopêن me her evdêن Îzdî be, Xwedanekî wan heye û her evdê ji bo Xwedanê xwe (li herêmên Xaltiyan hemû Îzdiyan) sê rojiyan digrin. Pêwîste meriv van her sê rojiyan, hefte yek berî roja ïna ku yekemîn dikeve meha kanûn(12)ê de, di roja sêşem, çarşem û pêncsemê de bigre û di roja ïnê de jî id(cejin)a Xwedanê xwe çêbike.

3. *Îd û rojiyên Ezî*

Li ser hemû evdêن Îzdî ferze ku van her sê rojiyên Ezî bigrin. Pêwîste meriv van her sê rojiyan, di heftiya meha kanûn(12)ê ye yekemîn de, di roja sêşem, çarşem û pêncsemê de bigre û di roja ïnê de jî id(cejin)a Ezî çêbike.

Zargotinê me de xwanê dibe ku ev rojî ji bo afirandina dinya yê jî tê ne girtin û dibe Îda afirandina dinyaye.



Wênê Îda Ezî 17.12.04 Oldenburg:

Ji çepêve: Şêx Evdo Mutlu, Eskerê Boyîk, Pîr Xidir Suleyman û ez

4. *Îd û rojiyên Çilê Zivistanê*

Tenê hinek dîndarêن Îzdiyan(yên weke Feqîrên Şê Adî û whd.) van çil rojiyên çilê zivistanê digrin û di dawiya meha çile yanjî di destpêka sibatê (2) de jî ida çilê zivistanê çêdikin.

5. *Îd û rojiyên Çilê Havînê*

Tenê hinek dîndarêن Îzdiyan(yên weke Feqîrên Şê Adî û whd.) van çil rojiyên çilê havînê digrin û di meha tîrmehê(7) de jî ida çilê zivistanê çêdikin.

6. *Îd û rojiyên ji bo Xwedan, Xas û Qelenderan*

Ji ber ku di Îzdiyatîyê de gelek Xwedan, Xas û Qelenderên dînî hene, ew gelekî bi xof û rahmîn û ew gelek id û rojiyan ji bo Xwedan, Xas, Qelender, Paresgeh, silavgeh, Ziyaret, Cemayî, dawetnebî û whd.ê ku di herêmên wan de hene û pîrozin digrin û cejnêن wan pîroz dikin

Nimûne:

a. Rojiyêñ Xidiryas û Xidirnebi

Ne ferze ku hemû Êzdi van sê rojiyêñ Xidiryas û Xidirnebi bigrin. Lê, evdê ku van rojiyan digrin, divê heft sala li ser hevûdinê, di heftiya meha Sibatê(meha 2) ye yekemîn de, di roja dûşembê, sêşembê û pêncşembê rojî bigre û roja ïnê jî cejna wan çêke.

b. Rojiyêñ Xatuna Fexra

Di Êzdiyatîyê de Xatûna Fexra Xwedanê zayînê ye, lewma hinek jin tenê ji bo wê rojiyekê digrin û ne ferze hemû jinêñ Êzdi vê rojiyê bigrin.

c. Wekî dinê :

Di meha çile(1) de rojî û ïda **Batizmî**, Belindê, Sersala (kurmancî).

Li ser ïda Batizmiyê weha tê ye gitin:

“ Cejna Pîrê Al

Batizmiya Pîrê Al
Cejneke xweş û delal
Jin û zarok, mêt û kal
Wê pîroz dikin her sal
Ew cejneke kevnar e
Li gund û li bajar e
Li ziving û diyar e
Şahî û dilan li dar e
Ew cejna pîrê pîran
Li çar enîskê Kurdistan
Govenda keç û xortan
Her kes dibe wek biran

Yekşem cilşo û paqîjî
Pîrê Al tu her bijî
Bi hiş û dil û mejî
Dest pê dike dilxweşî
Duşem-sêşem du rojan
Xêr û nanê miriyan
Bo hejar û sêwiyan
Toreya ezdayiyan

Çarşemê pezguran e
Li ser ser û çavan e
Karê cejna ciwan e
Xêr û xweşıya mala ne

Pêncşemê pîrozî ye
Roja xal û xwarziya
Ya ap û biraziya
Ya dê û bav û sebiya

Zarok li malan digerin
Bê xelat venagerin
Bi kîf, bi bask û per in
Rûgeş û dîlawer in

Şevronk êvara ïnê
Her kes xwe dixemilînê
Pîrê Al bi bîrtînê
Hêviyan dinasînê
Înê xew û razan e
Ji bo kal û ciwan e
Bo xweza û însan e
Rehetî û vehesan e
Şemî kar û xebat e
Bo deborî lebat e
Ji bo hemû malbat e
Bawerî û qinyat e

Yekşema dawî sersal
Li ser sera Pîrê Al
Xwişk û bira û heval
Em bi te bûne xweş

<http://mitglied.lycos.de/lalis/modules.php?name=News&file=article&sid=29> "

Dîsa di meha Sibatê de rojî û ïda Qurbanê. Rojî û ïda Newrozê(21.3), Çarşema Sor (çarşema nîsanê ye duduva de), Roja Basinbar(20? Nîsan ê de), Cimaiya Şerefîdin(19 Tebaxê), Cimaiya Şêxadî(ji 6- 13 ê Kanûnê) û whd.

AMEDEKIRINA CEJNÊ

Di nav bawerî û zargotina me Îzdiyan de amedekirina rojên ïda roleke mezin dileyîzin. Amedekirina ïdan jî wekî rojên wan ji hevûdinê cûdene. Amedekirina cejinê ku çend rojan dihatine pîrozkirin, beriya ïdê bi wextayekî dest pêdikir. Her Îzîdiyî li goriya aboriya mala xwe libasên nû ji bo hemû evdên di malê de dikirî anjî bixwe çêdikir. Tê bîra min, wexta hinek kesan di havînê de benderê (ceh, genim, nok, nîsk û whd) xwe radikirin, dema di mehêن payîzan de pez-dewar, dar-komir, fêkî û tiştên xweyî dinê disirotin, ewan hingê mesrefen ji bo amede û pîroz kirina ïdan cûde dikirin.

PÎROZKIRINA ROJÊN ÏDAN

Li welat, gava roja êvara ïdê dihat, herkesên ku li derve li ser kar û barêن xwe bûn dihatin malê. Bixêr hatin didane zeyî û pismamên ji deverên dûr hatine ïda wan. Eger îmkan hebûna tû kesê Îzdî di roja ïdê de ne dicû ser kar. Hinek kevanî yên mala hêja berî roja ïdê û hinek jî roja ïdê serê sibê zû radibûn dest bi amedekirna xwarin(kutilk, pîçik, nanê sêlê, aprax, savar, tirşik, birinç û whd.ê) û vexwarinê ji gelek tahman dikirin. Gava xwarin û vexwarina ïdê hazır dibû û berî ku kulfetê malê li ser sifra ïdê rûnê, kevaniyan zadê para miriyên xwe ji xwarin û vexwarinê amedekirî derdixistn û ev nanê xêra miriyan dibirin didane wan malên ku belangazên gund bûn. Roja ïdê de herkesî libasên xwe yên nû û renge reng li xwe dikirin. Yên ku duha dizanîbûn duha û wahzên xwe dikirin. Di pey re kulfetê di malê de dicûne dest û rûyên hevûdinê paçûdikirin û her wusa jî dicûne ïda malên cînar û hemû gundiyyen xwe pîroz dikirin.

Gelek kesên ku ji hevûdinê xeyîdîbun jî bi munaseta van rojên ïdan li hevûdinê dihatin. Roja ïdê li her gundên Îzdiyan de sifra xwarin û vexwarinê di nava hemû malan de heta êvarê ji erdê ranedibû. Zaroka di van rojan de şekir, gûz, findik, pere, mewîj, hejîr û gelek xwarinê dinê ji xwe re didane tomarkirin.

Gelek caran meriv serê sibê dicû ber qup, ziyaret, silavgeh û cîhêن pîroz pez û dewar ji bona ocaxêن(xwedanê) wan dikirine qurban. Xwarin bi hevûdinê re li wan cîhan çêdikirin û dixwarin. Pir kesan jî pere û tiştên nav malê xêra miriyên xwe didane merivên dûnav û malên belangaz. Her kesî û bi taybetî jî qîz û xortan heta derengî şevê bi hevûdinê re dawet û dîlan dikirin.

Di rojen ïdên cemayî û dawetnebiyan de, her malekê serê sibê radihîste sêniyên xwarina xwe û dicûne li bênder anjî li ser serê xaniyan datanîn û tevan bi hevûdinê re li ser sifra rêzkiî rûdiniştin û ew xwarina anî bi hevûdinê re dixwarin.

Dûre dîsa bi hevûdinê re pir leystikên cude(dawet, dîlan, dengbêjî, qebê, bahzdanê, xar û pere, tevşoyê, nîşan girtin, dîk-gah-gamêş berehevdan, giranî hildan û whd.ê) dileyîstin.

PÎROZKIRNA CEJNÊN LI EWRÛPA

Berî ku em koçi Ewrûpa yê bibin, gelek ji me bi van kevneşopên bav-kalan mezînbûn û me ew xwedî dikirin. Lê, hinga ku em hatine nava van welat û çandêن xerîb, em ji hevûdinê dûrkentin, mane bi tenê, tifaqa me ye heyî jî pelişî û me gelek kevneşopên bav-kalan jî ji bîra kirin.

Belê, bila rahma Xwedê li ser hemû kes û malbatêن ku bi taybetî ji bo damezirandina van mal û komelên Îzdiyan zahmet dane xwe be. Gelek xwandeva jî dizanin ku berî her kesî û rêxistinê li Ewrûpa yê me çend kes û malbatê li bajarê Oldenburgê di sala 1993 de dest bi fikra damezirandina rêxistin û avakirina mala Îzîdiya ye serbuxwe kir. Vêca şikir ji Xwedê re vaye

îro ev mal û komelêن me li gelek bajarêن dinê vebûne û bi xêra xebata wan êdî hinek kevneşopêن me jî nûjen dibin û têne xwedîkirin.



Wêneyekî Cejna Çarşema Sor ya sala 2005 li Mala Êzdiyan- Oldenburgê.

Bê guman, ev xwedî lê derketina urf û adetên me yên li Ewrûpa ne li gorî şertên welatên me têne şopandin. Li vira malxo û kevaniyêن malan hew dikarin bêjine kulfetê malê; hûnê di rojêن îd, şahî û şîna de van libasan li xwebikin. Anjî kes hew di rojêن îd û cejnan de diçe li nav malan di gere. Hur û girêن me êdî ne li bênder û meydana de bi hevûdinê re dileyîzen û nan duxin. Li virê jî, heta ji me Êzdiyan tê em hêjî gelek kevneşopêن (fito, xêr, zadê ji bo miriyan, sunet, bisk, dawet(şahî), şîn, pîrozkirina cejna û whd,ê) xwe di nav salonêن mal û komelan de nûjen û xwedikin.

Ez van cejna li hemû heval, Êzdînas û xêrxwazêن Êzdiyatîyê û xwandevanan pîroz dikim, hêvîdarim em di nava sala bêde jî di saxî û armancêن xwe de her serkevtî bin.

Li gel rêz û silavan

Kemal Tolan

09.12.06